| | |
|---|---|
|  Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl) |  wergera ji erebî: Mustefa Reşîd |

# Tîrêjên Çarşembê

## Xelek - 39

## Hevbeşiya Kurdî - Aşûrî di kûraniya dîrokê da

Ew herêma ku di hezarsala sêhem b.z. da jêra "*Sûbartû*" digotin, û piştî wê di hezarsala duwem b.z. da nav lêkirin "*welatê Aşûr*", li sêkoşeya bakur-rojava ya Herêma Başûrê Kurdistanê dikeve. Hary Sager dibêje:

Aşûr di bingehê da ew herêma li ber kenara çemê Dijle ya navîne. Sînorê vê herêmê ji bakur da heya bakurê Mûsilê ye, li cihê ku kuntarên çiyan bi dawî dibin û deşt destpêdike. Bi aliyê başûr da dora 130 Mîl dirêj dibe heya bakur-rojavayê Bexdadê; li wî cihê ku çemê Dijle di navber hin giran ra derbas dibe ku jêra çiyayê Mexûl dibêjin, li rojavayê Dijle û çiyayê Hemrîn li rojhilat. Li rojavayê çemê Dijle deşteka fireh heye jêra "Herêma Cizîrê" dibêjin[1].

Amir Hanna dibêje: "Dîrokzan Georges Roux di rûpela 378-an ya pirtûka xwe da bi navê "**Îraqa Kevin**" dibêje: Li dawiya sedsala 10-an b.z., yanê dora hezar salî piştî ku *Şemşî Addad* dewleta aşûrî damezrand, firehiya herêma ser bi dewleta aşûrî ji herêmeka erdnîgarî ya teng ku dirêjahiya wê hema hema 100 mîl û firehiya wê ji 50 mîlî ne bêhtir bû"[2].

Di wê erdnîgariyê da tevlêbûn û pişaftinek bi dirêjahiya du hezar sal di navbera Amûriyên samî  yên ku nû hatin wê herêmê û niştecihên zagrosî yên resen (hin ji pêşiyên Kurd) da pêkhat. Bi encama vî pêvajoyê tevlûbûne pêkhateka neteweyî, çandî û ayînî nû çêbû ku hêmanên wê samî-ariyanî bûn ji Amûrî û zagrosiyan ku bi navê Aşûrî tê naskirin. Em ji vê pêkhatê ra (*Hevbeşiya Kurdî - Aşûrî*) dibêjin.




Herêma Aşûr (Sûbartû) ya nawendî di hundirê emperatoriya Aşûr da

### Hin dawer û belgeyên din:

Daku ev hevbeşiya aşûrî-kurdî wek rastiyeka dîrokî bê piştrastkirin û ne ku ji nîgaş û xeyalê ye û ne jî hatiye duristkirin, em van agahdariyan pêşkêş dikin:

- Hary Sager dibêje: "Yek ji neviyên *Şamşî Addad* bi dotmîrekê ra zewicî ku ji êleka xurt ya wê herêmê bû. Navê wê dide zanîn ku ew horî ye"[3].
- Hary Sager li cihekî din dibêje ku hin dawer hene wê yekê nîşan didin ku Horî ji bakur da hatine herêma navbera herdu çeman (Mêzopotamiya); belkî jî bilindcihên Mîdiya hatibin. Ew bi ser va dibêje: Hinek dibêjin: "Horî niştecihên herêma Aşûr yên resen bûn; ew li ser destê Samiyên koçber di hezarsala sêhem b.z. da heya bi kuntarên çiyan hatin têvedandin yan jî derêxistin"[4].
- Amir Hanna dibêje: "*Şamşî Addadê Yekem* (*Shamshi Addad I*) (1813 - 1781 b.z.) di destpêkê da li bajarê *Aşûr* serdarî kiriye. Ji lew ra, navê dewleta wî aşûrî ye. Di pey ra rêveberiya xwe bire *Ikallatê* daku ji cemawerê *Şûbaran* (Sûbaran) xilas bibe, ewên ku reng û şêwazê jiyana xwe ya taybet dabûn bajêr û ev şêwaz ji xwerisk û adetên *Babilyan* dûr bû"[5].
- Amir Hanna dibêje: "Li dor sala 1750 b.z., yanê piştî mirina *Hammurapet* Khoriyan (*Horiyan*) destpêkir ji warên xwe yên çiyayî navbera Torosan li nêziya *Karkamîş* (Cerablûs) heya derya Wanê têkevin bakurê Mêzopotamiya....Horiyan dikarîbûn zorbeya bakurê Mêzopotamiya (*Herêma Sûbartû*) têxin bin kelîja xwe"[6].
- Dîrokzanê almanî Max von Oppenheim di pirtûka xwe da (Mêzopotamiya, rûpel 204 - 205) dibêje: "*Şamşî Addadê Yekem* talankerekî biyanî bû (li gor Şûbarên (Sûbaran Asiyayî), Bajarê *Aşûr* (paytextê *Sûbaran*) bi darê zorê stand û hewl da ku dewleteka herêmî damezrîne"[7].
- Amir Hanna dibêje: "Di rastiyê da hemû rûniştivanên Mêzopotamiya heya kesên cade û kolanê jî li herêma bakur (=*Sûbartû*), herweha desthilata asayî li *Babil*, hemiyan ji herêma bakur ra "*welatê Sûbartû*" digotin; ev nav heya dawiya emperatoriyê li Mêzopotamiya sala 539-an b.z. jî dihate bi karanîn"[8]. Hêja ye ku em bêjim di sla 539-an b.z. da padîşahê Faris Gohreşê Duwem li nawend û başûrê Mêzopotamiya (Îraqa nih) padîşahiya Keldanî (padîşahiya Babilî ya dawî) xiste bin desthilata xwe û wisa ji gelên samî ra li wê herêmê ti dewlet neman heya hatina talana erebî îslamî li dor nîveka sedsala 7-an z. Ev yek tê wê maneyê ku navê "Sûbartû" li dora du hezar sal ji herêma "welatê Aşûr" ra dihate gotin.
- Ibrahîm El-Fanni dibêje: "Ji xwandina yekem em bawer dikin ku *Horiyan* sîma, reng û gona xwe dane *Aşûriyan*; ew taybetmendiyên ku wan ji *Samiyên* başûr cuda dikin"[9].
- William Durant dema li ser welatê *Aşûr* diaxive, dibêje: "Rûniştivanên wir têkil bûn ji Samiyên ku ji başûrê pêşketî (wek *Babil* û *Akkad*) û hin êlên ne Samî ku ji rojava hatin, dibe ku ew ji *Hittîtan* bin yan jî ji hin êlan bin, ku xizimatiya wan bi êlên *Mîttanî* ra heye, û ji Kurdan rûniştivanên çiyan yên ku ji Qefqasan hatin"[10]. Guman têda nîne ku erdnîgariya Horî / Mîttaniyan li tenîşt erdnîgariya Sûbartû bû. Lê belê, Hittît li herêma rojava ya Anatoliyayê bûn. Paytextê wan Hattuşa (Bogazkoy) li dora 15 km li rojhilatê Anqereyê dikeve. Ji lew ra, tiştekî suriştî ye ku di rewşeka wisa da peywendiya Sûbaran bi Horiyan ra hebe û ne bi Hittîtan ra. Derbarê gotina birêz Durant ku Kurd ji Qefqasan hatine, ev baweriyeke ku lêkolînerên dibista rûsî yên noivîsandinên dîrokî ev wisa belav kirine daku Kurdan têxin nav hevbendiya gelên Qefqasê (Ermen, Gurc û yên din), ew gelên ku di bin kelîja çandî û siyasî ya Rûsiyayê da bûn.

## Hin encamên dawî:

Ev dawer û belgeyên taybet bi *Sûbarî / Aşûriyan* me digihînin van encamên jêrîn:

1 - Ew gelê ku bi navê (*Athûrî, Aşûrî*) tê naskirin û hin caran jî bi nav *Kirîstiyanên Nestorî*, ew di bingehê da têkile ji *Samî* û *Sûbarên* zagrosî. Ev di hin gotûbêjên dîrokî da wek şaxek ji *Horiyan* têne hejmartin. Em bawer dikin ku dahûrîna tirşa nûklearî DNA ji komeka Aşûrî û Kurdên li herêmên çiyayî, wê xizimatiya nijadî di navbera herdu gelan da piştrast bike.

2 - Çanda gelê aşûrî têkile ji çanda gelên samî û çanda gelên zagrosî ariyanî û eve sedema lihevçûna di navbera sembola xweda "*Ahûra-Mezda*" da li ba pêşiyên Kurdan û sembola xweda *Aşûr* li ba pêşiyên *Aşûriyan* li gel lihevçûna dirûv, sîma û folklora gelêrî.

3 - çîna serdar li welatê *Aşûr* ji şaxê amûrî samî bû. Ji lew ra, zimanê samî da ser zimanê sûbarî (horî) û sembol û dêlîndêzên ayîna samî jî wisa. Lê belê, sembol û dêlîndêzên ayîna sûbarî ariyanî jî ketin nav.

4 - Xizimatiya nijadî û çandî di navbera herdu gelan da tê wê maneyê ku di kesayetiya kurdî da ya wê herêmê hin rahên samî hene û ku di kesayetiya aşûrî da jî rahên kurdî hene. Xeleka ku herdu gelan digihîne hev ew kok û raha *sûbarî / horî* ye.

5 - Ev xizimatiya nijadî û çandî bingeheka xurt û têkûze ku di navbera herdu gelan da peywendiyên alîkarî û hevtemamkirinê peyda bibin; li cihê ku dijayetî û pevçûn hebin. Ev dijayetiyên ku ji demekê ta ya din hin aliyên dijminane guř dikin û ji cudahiya ayînî navbera Kurdên misilman û Aşûriyên kirîstiyan sedemek ji bo tûjkirina dijayetiyê bi kartînin.

Çarşemb, 23.12.2015

## **Jêder**

[1] Hary Sager: Mezinahiya Aşûr, rûpel 8. Harvy Porter: Berfirehiya kurtahiya dîroka kevin, rûpel 47
[2] Amir Hanna Fettûhi: Keldan ji destpêka zeman, rûpel 172.
[3] Hary Sager: Mezinahiya Aşûr, rûpel 53.
[4] Hary Sager: Mezinahiya Aşûr, rûpel 52-53.
[5] Amir Hanna Fettûhi: Keldan ji destpêka zeman, rûpel 174.
[6] Amir Hanna Fettûhi: Keldan ji destpêka zeman, rûpel 175
[7] Amir Hanna Fettûhi: Keldan ji destpêka zeman, rûpel 101.
[8] Amir Hanna Fettûhi: Keldan ji destpêka zeman, rûpel 154.
[9] Ibrahim El Fanni: tewrat, rûpel 101.
[10] William Durant: Çîroka şaristaniyê, 2/469-470.